BIRÊVEBIRINA MILMILANA SIYASETÊ

Dr. Şêrzad Necar
Kurmancîkirin/ Arî Mihemed

Siyaset, weku feylesofê navdarê yunanî Arîstotalês eşkere kiriye, ji bizavên mirovayetî û bi destveanîna armanc û berjewendiyên giştî pêk dihê, çi di nav civakî de, çi di nav dewletê de.

Bo gehiştinê bi wan armancan jî, ku dewlet roj bi roj komeka tengije û milmilaneyan li gel yekeyên dî di kawdanên dewletî de, ango li gel dewletan bi şêweyekê serekî. Serderîkirin li gel vê tengêjê û milmilaneyê, pişkeka serekiya bizavên mirovayetiyê ye ku di çarçovê siyasetê de dihêne bicihanîn. Da ku van bizavan bi hûrî aşkere bikin, divê siyasetê ber bi wê milmilaniya heyî araste bikin, ku di çarçûvê bizav û mekanîzma siyasetê de dihên pêş. Bi taybet jî siyaseta dewletî û peywendiyên dewletî, paş dîtina çareseriyên ketwarane bo bikin û piraktîk bikin pêxemet vekolîna wê milmilanê.

Bi vî awayî siyaset li gel hindê ku bi bizavên mirovayetî bihê hijmartin û di heman dem de milmilanê jî pêxemet hêz û kontorolkirinê bi xwe ve bigire. Bi vî awayî li serî bas jê kirî, siyaset dibe bizaveka mirovantî, belê di heman dem de jî; (bi taybetî siyaseta dewletî), milmilanêye pêxemet hêz û kontorolkirinê weku profesor Hans Morgentawo di pirtûka xwe ya navdar de, siyaset di navbera neteweyan de; Politics among Nation, aşkere kirî.

Ango milmilanê Straggle pişkeke giringe ji sirûştê siyasetê, diyardeyên sirûştî jî di şiyan de ye di siyaseta dewletî de bihê aşkerekirin. Ewe ye ku siyaset pire ji milmilanê girjbûnan, ew jî hemû pêxemet kontorolkirinê û destveanîna hêz û desthelatê ye û kartêkirine li ser rewşa dewletekê. Belê gehiştin bi vê armancê, li ser wan kesên biryaran di dewletê de çêdikin giringe. Heta ku di şiyan de be demê girjbûn û tengavî dêhêne pêş di demê peydabûna milmilanê de, bi rêvebirinê dikin ku gereke ew siyaseta, ew peyrew dikin ya nexşekirîbe.

Li vê derê pirsyarek dêhête pêş: aya dirûstkerên biryarê ew xwest û şiyan hene ku di rehendên milmilanê bigehin û kargeriya wê bikin bi şêweyekê ku armanca siyasî bi dest ve bihê?

Bersiv wê bi nerêbe, eve jî li ser wan binemayan dimîne ewên biryarê dirûst bikin ku di ast rehend cûda cûdane û peywendî van xalan ve hene:

- Çaweniya hizirkirinê
- Çaweniya danana mekanîzm û aşkirakirina rêk û cihan.
- Çaweniya cihanînê.

Ev her sê rehendên diyarkirî bi zanistê siyasetê ve gêrêdayîne û jê re dibêjin bazneya siyasetê; Political Circle. Ev bazneye bi rêxistina hezirûbîr û boçûna radibe û pirsyarekê pêk dihîne; ew jî alozî çi ye?

Ev pirsyare, gelek gewherî û pêdiviye bo aşkerekirina sirûştê aloziyê. Bi şêweyekê ku bê vê pirsyarê bi şiyan de nîne destkarî di aloziyê de bihê kirin û li gor ronahiya wê pirsê biryar dihêne dirûstkirin. Vê hizirkirinê û zanîna şêweyê aloziyê dê kartêkirin li ser weşandina biryaran jî hebe û şêweyê serederîkirinê li gel wê aloziya hatiye pêş wê şiyan de be bêhê destnîşankirin.

Bi vî rengî, dê alozî û layenên wê yê destpêkî xuya bin û bi rêvebirina wê milmilanê jî li gor naskirina wê, dê bihê serederîkirin. Bi vî awayî digehîne wê çendê ku bi rêvebirina alozî û milmilanê û girjbûnan di siyasetê de li ser astê dewletî, di vê bi şêweyekê dorhêlane bihê serederîkirin; Real Politic. Wesa xwediyên biryaran, li milmilanê û girjbûnan mêze dikin. Dorhêl di siyasetê de di sepîne ku divê serederîkirin di çarçovên van pirsyaran de be:

- Ewê biryarê dide gereke bizanibe li gel kê serederiyê dike?
- Hêz û şiyanên wan çandin yên serederiyê li gel dike?
- Xwediyê biryarê çend hêz û şiyan li ber dest hene?
- Demê biryarek dihê wergirtin, kartêkirinên wê çendin?
- Dê çawa encamên biryareka diyarkirî di siyasetî de wergirîn, bi taybet di siyaset û têkiliyên dewletî de?

Bi vî awayî pêdiviye li ser diristkerê biryarê van hokaran pêkve li berçav werbigire, heta ku bişên biryar û siyaseta xwe bi şêweyekê bidarêje ku di şiyan de be bihê bicihanîn û kardanaveyên nerênî di gel de nebin. Çinku demê kardaneveyên nerênî peyda bûn dê hereşe li ser desthelatê bihêne kirin.

Jêder: Kovara Gulan; hejma 659-12/11/2007